

## HEVGIRTINA MALBATÊ YA DUBLÎN

### PIŞTGÎRÎYA HIQÛQÎ YA PENABERAN. EM KÎ NE?

Piştgiyariya Hiqûqî ya Penaberan (RLS) rêxistinek e ku di sala 2017 de ji hêla parêzerên koçberiya Brîtanî ve hatî damezrandin. RLS tîmek piçûk e ku li Atînayê, Yewnanîstanê dixebite. Em alîkariya mirovan dikin ku ji bo hevpeyvînên penaberiye xwe amade bikin û di bûyerên hevgirtina malbatê de agahdarî û arîkarî pêşkêş dikin.

### HEVGIRTINA MALBATÊ YA "DUBLÎN" ÇÎ YE?

Dublin rêzîknameyên Dublîn III - qanûna Yekîtiya Ewrûpa, ya ku biryara endamên EU ye ku berpirsiyarê doza mafê penaberiye dike. Welatên 'Dublîn' welatên YE ne digel Norwêc, Îsland, Swîsre û Lîxtinşteyn.

Qanûna Dublîn ji bo penaxwazan vedigere ku bi malbatên xwe re bêne vegerandin bi navgîniya pêvajoyek bi navê hevgirtina malbatê.

Heke doza we ya hevgirtina malbatê ya Dublînê serketî be, hûn ê li welatê ku malbata we lê ye bêne veguheztin - hûn wê hingê derbasî pêvajoya penaberiye bibin li wî welatî. Hûn bixwe vîzayek li wî welatî nagirin ji ber ku doza hevgirtina malbata we serketî bû.

### KÎ DIKARE JI BO HEVGIRTINA MALBATÊ DUBLÎN SERLÊDAN BIKE?

Mezin dikarin serlêdanê bikin da ku bi zarokên xwe yên nezewacî re, an mêr / jina xwe re bêne cem hev. Divê bi malbatê ve girêdayî bimînin, malbat girêdayî penaberiye bibin an xwedan statûyek parastinê bin.

Zarok dikarin serlêdanê bikin da ku bi dê û bavê xwe / serperîştên qanûnî, xwişk, dapîr, bapîr, dayik û birayên xwe re bîn ba hev. Divê endamên malbatê tenê li welatekî din bi qanûnî amade bin.

Di hin rewşan de mezinan dikarin serlêdana hevgirtinê bi dê û bavên nezewicî re bikin. Di heman demê de mezinan dikarin carinan serlêdan bikin da ku bi zarokên xwe an mezinên xwe re an jî bi endamên malbatê re bîn cem hev.

Lêbelê, wan divê sedemên ciddî hebin- wek sazkirina girêdayîbûna endamên malbatê, an sedemên din ên mirovahî. Pirsên ji bo serlêdana bi vî rengî pir in, û her kes nikare wan bicîh bîne.

## EW ÇAWA KAR DIKE?

Divê hûn li Yewnanîstanê daxwaza penaberiyê bikin da ku hûn bikarin hevgirtina malbatê bixwazin. Dema ku hûn beşdarî qeydkirina Dezgeha karûbarê penaberiyê dibin û "Karta Spî" / "Ausweis" bigirin, divê hûn ji rayedarên re bêjin ku we malbatek li Dublin heye û hûn dixwazin ji wan re bête cem hev.

Pêdivî ye ku hûn û endamekî malbata we ku hûn dixwazin pê re bête cem hev, nameyek razîbûnê îmze bikin. Pêdivî ye ku hûn ji Daîreya Karûbarê Penaberiyê ya yewnanî re tîlefona, e-mail û adresa postê ya malbata xwe bidin. Pêdivî ye ku hûn belgeyên ku di derheqê rewşa endamê malbata we li welatê pêşwaziyê de piştrast dîke û delîlên tîkiliya malbata we, bidin daîreya karûbarê penaberan ya yewnanî. Heke gengaz be belgeyan wergerînin zimanê welatê pêşwazî an jî Înglîzî.

Pêdivî ye ku Yewnanîstan daxwaznameyê ji welatê pêşwaziya we re bişîne da ku ew welat berpirsariya doza mafê penaberîya we bike. Pir girîng e ku ev daxwaz di nav 3 mehan de ji hêla Yewnanîstan ve were şandin. Heke hûn dixwazin ji bo beşdarî malbatên li Elmanyayê bibin û bête veguheztin, divê hûn zanibin ku di heman demê de di nav 3 mehan de ji roja ku hûn li Yewnanîstanê hatine tomar kirin jî, ji bo Ku daxwaziya we ya penaberiyê ji hêla Almanya ve bê pejirandin, ji bilî roja ku doza we ya penaberiyê li Yewnanîstanê tomar kiriye û karta weya spî jî tê standin, ji wê girîngtir roja ku şopa tilfeyên we hatine girtin, tê hesibandin.

Wê demê divê welatê pêşwaziyê dema 2 mehan da bersiv bide - heke ew bersiv nedin ev tê wê wateyê ku ew bixweber berpirsariya doza penaberiyê we qebûl dîkin.

Heke welatê pêşwaziyê daxwazê ji bo hevgirtina malbatê red kir, hûn dikarin daxwaz bikin ku ew di nav 3 hefteyan de doza we ji nû ve lêpîrsîn bikin.

Heke welatê pêşwaziyê daxwazê ji bo hevgirtina malbatê qebûl bike, divê hûn di nav 6 mehan de ji wî welatî re bête veguhestin. Firînen we dê ji hêla rayedarên Yewnanî ve bête arastekirin û xerc kirin.

## DIVÊ EZ ÇI BIKIM?

Ew zehf girîng e ku hûn piştrast bikin ku rayedarên yewnanî ji daxwaza we ji bo hevgirtina malbatê ya Dublin agahdar in, û hûn piştrast bikin ku we û malbata we li welatek din formên razîbûnê îmze kirine. Ji van û belgeyên din ên ku diçin Karûbarê Penaberîya Yewnanîstan, kopiyên bigirin. Ji Karûbatên Penaberiyê ya Yewnanî kopiyek ji " pesend kirina dosya we ji aliyê welatê pêşwazîker" bixwazin.

Eynî tişt ji bo malbata ku hûn dixwazin pê ra werin cem hev, rast in. Berî her tiştî, hûn hewce ne ku ew bizanin ku ew ji serlêdana we agahdar in û razî bûne ku hûn li wir bête cem hev.

Pêdivî ye ku hûn bi berdewamî û rêkûpêkî serî li dezgehên penaberiyê yên yewnanî bidin, agahdarî bersivên wan bin, heke pêdivî be belgeyên nû hebe. Pir girîng e ku hûn di zûtirîn dem de bersivên daxwazên ji bo agahdariyên zêdetir bidin. Heke ji we re were gotin ku meseleya we nehatiye pejirandin, kopiyek ji nameya redkirinê bixwazin.